

HEJMAR

12

%100  
KURDÎ

# Pîne

agirê we geş bel..

Ji bîr  
nekin.  
Berî  
Dozgerê  
DGM'ê  
bistînin!..



kovara qerfî û wêjeyî ji panzdeh rojan carekê derdikeve 16-31 mart (adar) 2000 Sayî: 12 1.000.000 TL

**HETA NIHA DI CEJNÊN OLÎ DE PEZ Û  
DEWAR, DI NEWROZAN DE QURBAN EM  
BÛN: ÎCAR HERDU CEJN KETIN HEMAN  
DEMÊ!.. GELO NIHA JÎ KEVOK E?!..**



NALÊT LÊ BE!..  
MIN DÎSA JI BÎR KIR...  
CEJNA QURBANÊ MÎ  
DIHATE SER JÊ KIRIN!..  
BILA BE! EZÊ VÊ LI  
NEWROZÊ SER JÊ KIM!

\*Ji ber çavbirçîtiya patronan, me Pîne ji bo vê hejmarê kir milyonek.  
Netirsîn, hejmareke din dîsa 500.000 e. Ma derxistina ferhengokekê wisa  
hêsan e!.. Kî Pîneyê nestîne, di Newrozê de bêtêker bimîne!..

**PÎNEBOY**

"Serê Newrozê binê Newrozê  
Xwedê tekerekî bide vê mal û dozê!"

\*\*\*

- Elo doxînbaş! Ez **Yildo!** Ew der Pîneboy e. Li gorî saloxan we dest bi derxistina kovara **Tolazboy** kiriye! Ez jî dixwazim tê de bixebitim... Belediyeya Stenbolê we gelekî dipesînel..

- Kuro! Van kelevajî û pêçeqûniyan kî derdixê! Em ji çira şerabê ne, bibore şîr in!

- Ez ketime bextê we! Ezê bêpere bixebitim, karekî bidin min jî.

- Ya star! Bicehimel..

\*\*\*

- Elo ez **Banû Alkan!** "**Neremi neremi? Pîne mi!?**" Ez dixwazim ji bo Tolazboy poza bidim!

- Kurederê bixwî! Sîmikonmîratê! Tu kêmbûyî!

- Kuro tu çima xwe gjî dikî! Me çî got. Ji dil dibêjim, ez nabim "**Bedewa Kartolê**", ezê bibim "**Bedewa Pîneyê**"!.. Pîne bistîne... bigerîne...bixwîne!.. Jê nemîne..

- Keçê bela xwe ji me veke! Ezê niha rabim tel..

- Bêhenek! Doxîna te ava! Ka zû were!..

- Yarebî tu çêkî!.. Ev çî sosretîk e!..

(Niha Cemil Denli ji ber ku telefona xwe ya destan wînda kiriye, guhê min qul kir, nahêle ez nivîsa xwe binivîsim!)

\*\*\*

DGM'ya Îzmîrê ji bo peywîrdarekî lêgerîne (araştîrma görevlisi) yê Zanîngeha Egeyê, ji ber ku bi rîya înternetê mesajên protestoyî şandine, doz vekirîye. Li gorî navenda nûçeyan a Pîneyê DGM'yê, niha jî, li hemberî padîşahê Împaratoriya Osmanîyan **Qanûnî Siltan Silêman** û neviyên wî de jî doz vekirîye! Ji ber ku wî di nameya xwe ya ku ji bo Qralê Frensayê François de gotiye, "ez hikumdarê ahaliya Kurdistanê me." Her weha ji bo François jî serî li Interpolê daye û Frenseyê jî gotiye, "wî li me vegerînin!"


**RIZO DIZO**

Imam Cici



**DOZO**

Biracan



**RAGIHANDIN**

Xwendevanên Hêja ferhengoka Pîneyê wê 15'ê Avrêlê ji bo xwendevanên Pîneyê yên li Elmanyayê bê belavkirin. Ferhengokên aboneyên me yên li welatên din ên li Ewrûpayê bi rê ketin.

Ev hejmara Pîneyê ji aliyê Özgür Politikayê ve ji bo hemû xwendevanên wê wekî diyarî tê dayîn.

# NANE SÊLÊ

Sosyeteya Tirkîyeyê ji bo kêfîkirinê tu sînor û rêz û rêçikan nas nake!..

DGM ji bo ku hunermend Ahmet Kaya got ezê straneke bi kurdî bêjim, 3 sal 9 meh ceza li wî birî!..




DGM'ya Îzmîrê di derbarê pey-wirdarê Zanîngeha Egeyê Ahmet Şahîn de ji ber ku bi riya İnter-netê hin sazî protesto kirine, doz vekir!..



\* SABİKA KAYIT BELGESİ.

"Newroz tê, Newroz tê, tu bûka Mehabad"




Qomisyona Mafên Mirovan a TBMM'ê li Stenbolê, li qereqolekê derbena filîstînê dît, lê waliyê Stenbolê Erol Çakir got şiveke beradayî dîtine!..

HÎÎ... HÎÎ... KEREM KIN BİRİZ MEBÛS! MA KÊ GOTINE LI QARA-QOLA ME DERBENA FİLİSTİNÎ KEYE!

DGM'ê salek cezayê hepsê li kevneserokê Partiya Refahê Erbakan birî!.. Tu kurdan wekî depoya reyan jî bibînî, tu bê ceza namînî!..



Serçete Halûk Kirci li dadgehê sola şovmenan di şibakê re avêt!..



Şeref MUMCU.



\* FİLİSTİN ASISI.



Şeref MUMCU.

# LAL

NIVİSKAR: İMAM CİCİ  
XÊZKAR: ERTUĞ SÖNMEZ



ALOJ BEN LAHMACÜN İSMARLAMIŞTİM... BİR SAAT KADAR ÖNCEL..



ANLIYORUM AMA MİSAFİRLERİM GELECEK. BİRAZ ÇABUK LÜTFENİ..



ŞURDA DÜŞMAN GEMİSİ GÖRDÜM

MIN BALEKEŞTİYEKE (uzay gemisi) DJJMIN DİT

ELOJ MIN LEHMECÜN XWESTİBÜ... BERİ NIHA Bİ SAETEKİ..


EZ WE FÊM DIKIM LÊ, WÊ MÊVANÊN MIN WERİN. JI KEREMA XWE HİNEKÎ ZÜ BİKİNİ..



HADİ ÇOCUKLAR MİSAFİRLER GELMEDEN NENENİZİ ODASINA GÖTÜRÜNİ..

ZATEN LALDIR OI.. NE GEREK VARI.. OTURSUN ORDAI..


-DE KA ZAROKNOI BERİ KU MÊVAN WERİN, DAPİRA XWE BIBİN ODEYA WÊI..  
-JIXWÊ LAL E EWİ.. NE HEWCE YE... BILA LI DI CİHÊ XWE DE RÜNEI..



SAÇIM NASILI.. GÜZEL OLMUŞ MU? Bİ DAKKA KAPI ÇALINIYORI..

SONRA ARARIMI..

-PORÊ MIN ÇAWA BÜYEI, XWEŞİK BÜYE? HELA BİSE DERİ LÊ DIKEVEI..  
-EZÊ PAŞÊ TELEFON BİKİMİ..



LAHMACUNLARI GETİRDİMİ..

YUKARI GETİRİ..

-MIN LEHMECÜN ANANI..  
-BİNE JORI..



HADİ BAKALIMI.. BIRAKIN ARTIK OYUNU..

-DE KAI.. ÊDÎ DEV JI LİSTİKÊ BERDİNİ..



SİPARİŞLER SİZİN Mİ?

-SPARİŞ ÊN WE NE?..



İKİ SAATTİR NERDESİN SENİ..

ANCA ABLA SENDEN ÖNCE BEŞ YERE UĞRADIM..

SUSL. Bİ DE UKALA CEVAP VERİYORL.

-EV DU SAET IN TU LI KU Yİ KUROI..

-INCAX BŪI BERİ VIR EZ ÇŪM PENC DERANI..

-HIŞI.. DI SER DE Jİ QURETİY Ê DIKEI..



BES E ÊDÎ JI DESTÊ WEI.. MA HŪNÊ RUHÊ MIN BİSTİNİNİ..

KONUŞTUĞUN DİLİ ANLAMİYORUMI..

-EZ JI ZİMANÊ TE FÊM NAKİMİ..



KURÊ MIN, TU Bİ KU DE BİÇİ, MIN Jİ Bİ XWE RE BİBÎ..



AAA! NENE KONUŞTUI.. O ADAM KİM?..

LAHMACUNCUI..

-WEYI.. DAPİR PEYVİ!.. EW ZILAM Kİ YE?  
-LEHMECŪNCŪ



KESÊN WEKÎ DIN KU Bİ ZİMANÊ ME DİAXIVİN HİN HENE?

BI RASTÎ..



MIN TENÊ TU DİT?



## Maf hebe jî, nîn e...

Ku hûn rastiyê bipirsin, nivîsa min a vê hefteyê jî ber sedemên nediyar, negihîste destê min... Her çiqas pînevanên me dibêjin, sedem stewrbûna afirandinê ye jî, ez bawer nakim, ez pir afirîner im, lê tevî hemû afirîneriya xwe jî, ez bi nêzîkbûna her hejmarê vê kambaxa Pîneyê dîkime vime tayê!.. Mijar nîn e!

Heye, lê nîn e!..  
Nebêjin çimal..

Bawer bikin ez binivîsînim jî, nawaşînim. Ger hûn bipirsin, ez bi xwe bersiva we nadim, bila Ferda Çetin bersiva we bide!..

Berî niha bi demekê, rojnameger, şair û siyasetmedarekî me yê kêr nav û deng ku ez nawêrim li vir navê wî hildim, li ser Hizbulnizanimçî (ez nizanibim jî, hûn bi xwe dizanin, ji ber ku hûn zêde bîaqil in) nivîsek pir dijwar di rojnameyên me yê bi tirkî de nivîsand.

Dibêjin, bi kerê nikare, diçe kurtên!

Nivîskarê me, qeweta xwe di kerê de nedîtiye, diyar e ku xwestiyê here kurtên, lê niya xwe şaş kiriye, çûye şêr û guran!..

Ji Hizbulnizanimçîyan bi sed qatî zêdetir, çêr li kurdan, tirkan, cihuyan, xiristîyan û misilmaniyê kirine..

Gotiye roma reş bi Hizbulnizanimçîyan roviyê xwe paqij dîke..

Rêxistina wan Hizbilhûndizanimçîyan li dijî kê hatibû avakirin?

Li dijî me kurdan, ne wisa ezbenî?  
Yanê?..

Yanê li gofî gotina vî rojnameger, şair û siyasetmedarê me, em dibine pîştîya di nav roviyên roma reş de!

Min jî nivîsek li ser çêr û xeberê wî nivîsand û ji rojnameyê re şand, lê Ferda Çetin çî bersiv bide min baş e?..

"Mafê te heye, te rast gotiye, baş gotiye, di cihê xwe de nivîsandiye, lê em vê nivîsê neweşînin çêtir e..."

De werinê ha!

Xwedê ji te razî, te bigota nivîsa te xerab e û te biweşanda, bawer bike ezê bêhtir pê kêfxweş bibûma..

### Jiweranot:

Çejna we ya Newrozê pîroz be û guhê xwe nedin tez û bîntezên Murat Badikî, min li ser efsaneyê Kawa Lêkolîneke hûr û kûr û dûr kir (hindik mabû ez bigihîştima fayên bin erdê! Xwedê ez xelas kirim) ez gihîştîme wê encamê ku binyata tez û bîntezên Badikî tune ye û tev binfilitî ne!..

# L' SER MUZIK A ME

A  
TISEK.

DENGÊJÊKÎ  
HENDÊR

QENKEMANÊN  
VÊ HIKAYÊ NIHA  
QARTISME  
TARTHE BONE..

DENGÊJAN; YANÎ QASETÊN KUXUKÎ!.. BIBORIN, LÊ DI QASETÊN WAN DE DENGÊ HER TISTÎ HEYE. KUXIK, GRINA ZAROKAN, PESINDAN, DENGÊ OTOMOBİL Û HEYA FIROKAN...

ÇEMEE ÇETELÊÊÊ ÇEMEKÎ SARE..

KUX!.. KUXEE!.. WEXXK!.. HUUXK!..

DIVÊ DENGÊ AXIÊ MIN JI TÊKEVE QASETÊ, NE WISA!.. WÎ, EWQAS ZİYAFET DAI... Û MÊVAN EZIMANDIN!

bila dengê min ji têkeDwa... AFERÎ KANIS AXA!.. BILBIL? KURDISTAN?!

GELEK HUNERMENDÊN KURD, JI BERKU KURDÎ QEDEXE BÛ, BI ZIMANÊN BIYANÎ STRAN GOTIN.

GUZEL SEN NÊREYEE GÛDYOOR! GUZEL SEN KÛME SEVÛYOOR

KURO WELLEN KES BI TE NAHESE! XWEOÊ NAHESE... MA KES NEMA, TU GÛNÎ HÎNÎ STRANA MÛRADO YABITIKÎ BÛYÎ!.. YAREBÎ TU ÇÊKÎ!..

ICACAZZ BÛ BELA SERÊ ME! EZ QURBANA EMÎN ERBANI BÎM!..

HUNERMENDÊN DAWETAN JI DI MUZIKA ME DE CIHEKÎ GÎRÎNG DIGIRIN... GELEK HUNER-MENDÊN ME, BIVÎ AWAYÎ DEST BI MUZIKÊ KIR... WEKÎ EMÎN ERBANI...

TEO-REO... GUN-REO! WIR?..

BÛRA MIIN! BÛRA MIIN! BÛR

QUZILQURTÛ BÛLÛRA WE!.. EV TISTÊ ECÊB, TEV JI MED TVYÊ HÎN BÛNE, NE WISA!.. DAWETA ME HERIMANDIN!

TEP!.. ÇIWWÊ! GÛRS!

ICACAZZ BÛ BELA SERÊ ME! EZ QURBANA EMÎN ERBANI BÎM!..

CIVAKA FEDAL LI BER PÊŞKETINA MUZIKÊ ASTENGÎ DERDIXIST...

WÎY!.. SENDO... HELIYAM EZ BÛM WEK PEMBÛÛ..

BRAVO!.. DI MUZIKA KURDÎ DE SENTEZEKENÛ! PÊŞEROJA MUZIKA KURDÎ!.. HER BÎTÎ...

SEO! SEO! HEAB!

ELÛKO!.. ELIYÊ KURÊ FATIMA!.. KURO, EW TISTÊ LI PAŞ QÛNA TE ÇI YE?? HELAA! TISTÊN SOSRET!

HÎ!.. GUNDIYÊ MIN... HIMQ!.. EZ REZÎL BÛM! NIHA WÊ HEMÛ GUND PÊ BIHESE... KRIV... PISMAN... KURÊ ÊŞIRAN... TÊK ÇÛM!

BI XÊRA TELEWÎZYONÊ, KURDÊN KU JI HEV HATIBÛN DÛRXISTIN, HÊDÎ HÊDÎ MUZIKA HEVDI NAS KIRIN...

GULNÎŞAN GUL... NÎŞAAN

HEVALÊ KAMKARS!.. HEVALÊ KAMKARS!.. HÛN DIKARIN "BERXWEDAN XWÎÊŞ" DOZE?..

BEÇLÛ KINÊ

ÊDÎ DAWIKÊN KURD JI TÊNE QONSERÊN ME VAYE PÊŞKETIN!.. EZ DIXWAZIM BIGIKÎM...

ERÊ CIWAN TU KETÎ DESTÊ MIN... "COT MEMIKAN BIDE BER GEZAN HA!.. TU EHLAQÊ GEDÊ MIN XERA DIKÎ HAA!.. GENIYO! NIHA EV SÛNIK SERÊ TE BIKÊVE!"



## Pakêtek Marlboro

Du hefteyên me li Sûriyê neqediyan, wel-weleyek ket nav xelkê. Xelk û qaçaxçiyên mezin li bin guhê hev ketin. Ew û hikûmat bi hev ketin. Çar ji wan û dudu ji hikûmetê hatin kuştin. Li dawiya dawiyê hikûmet bi ser ket û cixare ji piyasê rabûn.

Ê min, ev nêzî bîst salan e ku ez cixarê dikşînim. Ê ez tu carî jî bê cixare nemame. Îcar bi ser de li welatekî wek Sûriyê ku rehên esebiyeta mirovî her deqqe radibin ser piyan, ger cixare jî nebe divê mirov ya xwe yan jî hinekan bikuje.

Neyse di wê tengasiyê de me hefteyekê bi titûna qaçax, a ku ji serxetê dihat, îdare kir. Lê paşê ew jî bi dest me neket. A îcar nebû! Me çiqasî hewl da qet nebû; heta rişwet û bertîlê jî daxî pere nekîr. Wele em mecbûr man me partî kirin dewreyê. Ji hevalan yekî telefonî partiya Hemdînê Bajarî kir, yek ji mekteb-siyasî ya partiya Hemdîn hat ba me û bi dilekî şikestî got:

-Ev du hefte ye ku ji tirsê cixarê me civîna komîta merkezi li dar nexistî, çûnkî em ditirsîn ku endamên me di civînê de bi hev bikevin, cixare jî tuneye ku wan nerm bike, ji ber wê jî me civînên xwe avêtin piştî ku cixare derkevin piyasê.

Lê camêr navê hevalekî partiya Şemdîn el-Fellehî da. Me telefonî berpirsiyarekî wan kir, me wext û cih tesbît kir û li wî cihê ku me soz dabû hev, me hevûdu dît. Camêrê ku li ser navê Partiya Şemdîn el-Fellehî hatibû, wî jî em birin ba endamekî hizbekî îştirakî ya Sûriyê, bi wasita wî me yekî Baasî dît. Wî jî got:

-Hevalekî min î "exwan" heye, belkî ew bikaribe ji me re peyda bike. Dikana wî heye, li filan derê ye, ka bisekinin ez telefonî wî bikim.

Camêrê me yê Baasî telefoneke xweş a erebî kir. Li şûna ku di nav deqeyekê de bibêje "cixare heye-tuneye?" camêrê jî niv saetê zêdetir bi hevalê xwe yê "exwan" re suhbet kir. Piştî suhbeta erebî ya bi telefonê, ligel Baasîyê xwe, me berê xwe da dikana biraderê "exwan".


Em hatin serê kuça mêrikê exwan, hevalê Baasî li serê kuçê sekinî û bi desta dikaneke goştîroş nîşanî me da û got:

-Aha ew e, lê dîqqet bikin, bila kes bi we nehese ku hûn cixarê dikirin. Ez neyem, çimkî hevalên min ên Baasî ewê bixeyidin ku ez herim dikana yekî exwan!

Me got "baş e" û me da rê. Em hatin ber deriyê dikanê. Dêmax qey hevalê me yê Baasî jî hevalê xwe yê exwan re şikl û şemalê me tarfî kiriyê, çawa ku em çûn ber derî, exwanê me em nas kirin. Ney-se piştî "selam û eleykum" û "eleykume selam" û "ehlen bîkum" û "keyfekum" û "halekum". Mêri-kê goştîroş bi çavan îşaret da me, em bi dizî ketin hundurê dikana wî. Di dikanê de em ketin odeyeke din. Em li wê rawestiyân. Goştîroş çû dawiya ode, ji binê laşekî gê, pakêtek Marlboro derxist û da min. Min jî pênc qat zêdetir heqê wî dayê û min cixare xist bêrika xwe û bi gelek "şukren" û "kitîr şukren"an min xatir jê xwest û em ji dikanê derketin.

Heta roja ku ez ji Sûriyê vegeyriyam jî, ji bo derman jî cixare li piyasê tunebûn.

## Xezên Mirovî



## Bülent Morgök

## Firfirok



**LOZIN**



Haydar IŞIK

**DERSİMİJİ KOTÎ RA AMEYÊ**

Hemû rojnameyê tirkan dişmenê şarê mayê. Feqet jû esta ke, dişmenena aye bena berz şona aşme. Armanca mileta kurd bijêrê bixeniqnê, biqedînê û werte ra wedarê (hewadê).

Çend reyê mi wend ke rojnameger (Emin Çölaşan) Çölajani quncika xora qarîna, çira Özgür Politika eve tirkî nûsreno?. Çira APO tirkî qisey keno, wastoxnameyê (dilekçe) xo eve tirkî nûsreno? Yanê tirkî qisey kerdena ma biya derdê ey.

Ezo bawer kena, ey qafika xo werda. Mordemek biyo xînt (bom- dîn).

Nêwazeno ke ma tirkî qisey bikimi. Ma ke kurdî qisey bikimi, o wext jî vano şimayê çira kurdî qisey kenê.

Na meseleya şiyara dîroka verg û vorek. Verg corde serê awe de vindeno û qarîno vorek û vano: "Tiya çira awa min kena qilêrin?" Vorek jî vana:

"Tiyê corê awe de, ez çutir (senî) awa to qilêrin bikirî? Tabî tiya derdê vergî werdena vorek o.

Çölajan nûsreno û ma ra vano, şimayê meseleya kurdî kenê. Feqet bese nêkenê ke ziwânê xo qisey bikerê. Ez van ke rasto, ma ziwânê xo tam bese nêkenim ke qisey bikimi. Qusir kamî dero? Dewlata to nêverda ke ma ziwânê xo qisey bikimi. Dibistan (mekteb) çeye de kerdbi qedexe. 55 ser ra awebi, ez ke şiyoy dibistan, mamostey (mahlîmî) rojo verîn eve uşire (çiweya-çubuk) daye miro û vat: "Kurdî qisey meke"

Dewleta to 77 ser eve qanûna bingehîna (anayasa) ziwânê ma kurdan qedexe kerd. Şima firsend ma nêda ke, ziwânê xo bemi ravey. Tîpê winayin (niyanen) ra kes vano, dişmen û qafika nêweş.

Tîpê hênin jî estê ke cografya ma de xo ya sipe yan jî şa (siya) vînenê. Cahîlîna xo, bomena xo nêvînenê. Însan ke vajo, birêz care na pens niyaro (winayo). Vano rast niyo. Çira rast niyo? Çutir rast beno nêzono. Çike bingeha fikrê ey çîno. Belkî jî nêşiyoy dibistan yan jî şenik wendo. Feqet her çî o rind zano. Birêz delal, verê coy gosde, analîz bike, mukayese bike, şewe sero rakuwe, dima rexna xo bikeri.

Usilê rexney jî nêzonenê. Mi vat, di rengî nas kenê (silasnenê) şa ûsipe.


Tîpê bîn ke, tirk vanê "Kader kurbanî jû wendoxê ma, zîndanê Passau ra rexne keno û vano, ez Kirdkî rind zana, feqet Haydar Işık çî nûsreno nêzonena. Vano goreyê fikrê min, birêz Işık ziwânê Papua-Newguinea nûsreno. Herhel birêz Zîndanê Passau de ziwânê Papua-Newguinea misayo.

Birêz kader kurbanî, ti ke ziwânê ecnebî rind zanê, mara vaji belkî ma şarê Dêrsim Papua-Newguinea ra yenê (ameyê)? Dima jî vana wextê to zafo, ziwânê ma jî bimisi (bimûsi).

Birayê mi, ez rind zonen ke, ez Dêrsim ra yen û ziwânê Kimanckî qisey kena û nûsrena. A bîne jî, ti ke zazakî rind zanê, çira rexneyê xo eve zazakî nênsnenê? Onca jî ez sipaziya xo kena ke tiyê niwisan wanenê.

İMAM CICI

# HES XÊV



# SELWAR


Ender Ozkanromm

Nivê salên 1800'î... Kelogerma hêvinê, ji van sêlan diyarê. Kelogerma li Ûliyêki, kêzik, dîpîşk û pêşiyên ku SÊRTVAN bazar dikin... Lê ji hemûyan xedarê: MÊŞÊN KERAN. Mêşên girs, reş, û jehrîn!

Mêşên keran ku serê her hovîne peydâ dibûne û bi jin û mîran ve didane, xwedî taybetiyê ecêb û sosret bûne: Piranî êrişî NANKAN û qorikê mirovan dikirine... Li SÊRTÊ, ji ber van êrişan, serê her salê 200-250 kesî jiyandê xwe ji dest didaye...

Pîştî ku hejmarê miriyên zêde bûye, SÊRTÎ li çareya serê xwe geriyane... Wan êrişî mêşên keran kiriyê, lê dawayê revîşê wan ji berê xerabtir û kambaxtir bûye...

Wê demê, li SÊRTÊ terziyêki bi navê UBEYDULLAH hebûye... Hem bayê wî hem lawê wî, ji ber êrişên mêşên keran, ên li Ser NANKANê wan, mirine. Ubeydullah li dijî êrişên mêşan re bazeke xwedîroştîne pêk aniye: Wî çavê hinekî zêde bi kar aniye û kincêki taybet dirûtiye... Û biryar girtiye ku CARA PÊŞÎN LI SER XWIE BICERIBINE...



... Û çûye li ser kursî ronîstiyê! Pîştî keliyekê, mîşeke girs li nêvrûna wî daniye û derziya xwe fê re kiriyê, lê bi ser neketiye... Çandin fê re kiriyê... Lê bi ser neketiye!...

SÊRTMÊN ku bi vê yekê dihesin, ji vî şalê fireh, yek ji xwe re dane dirûtin û bi bêheke fireh di nêvê refên mêşên keran de geriyane...

... Ew çûye Kermêşan ku li cihê wê daniye. Ji ber derziya xwe, ku di şelwêrê de neçûye goşt, şerm kiriyê û lêxistiyê çûye...

Kermêşan Şelwêr qulqulî kiriyê, lê piştî ku fêr kirine, tiştek bi mirovan nêye, gelekî şerm kirine û ew herêrê teribandine.

... Ji wê rojê şûnve mêşan rîya xwe bi ser SÊRTÊ nexistiyê!...



Vayê xwendevanên PÎNEYÊ ên delal, min ji wê re qelê Serpêhatiya ŞELWAR kir, ku îro modela kreasyonên modeyê ya YEKTA û BÊHEMPA YE!...

## KES NIKARE JI NAV DERKEVE... TEVLÎHEV




-Tir û tivir di kevçî de min tivir xwar tir ma di kevçî de  
 -Tû gû mû bi deva cûm tû bi desta cûm mû û bi linga cûm gû  
 -Şeşt teşt mişt nîsk  
 -Kurm qurm qul kir kurm qurm qul kir  
 -Heft bax derzî bi derzî li qulika derziya diya min de bezi  
 -Lepêk qîr li konê me, konê me tev qîra xwe  
 -Min mişk bi şimikê kuşt

Zanîgeha 100. YIL/WAN



Pandey 2000





Efsaneya Newrozê

Hebû tunebû, an jî li gorî Cemşîr Bender hîna ku kes tunebû ew hebû, sal B.Z. kêr zêde 612 bû. Wê demê bi navê Kawa zilamek hebû. Li gorî agahiyên ku me ji arkeologan wergirtiye, li ser kevîrên Çiyayên Nînovayê, li ser tabletan ev destnîvîs tê dîtin: "med. www. hesinkawa. com. tr." Dîsa di tableteke din de jî "asûr. www. zalimdehaq. com. tr. tê dîtin. Me jî di cih de li ser kompîtûrê rûniştin û bi pey van agahyan ketin. Dawiya dawîn, me ev agahî kêr û zêde peyda kirin.

Li gorî agahiyên "med. www. hesinkawa. com. tr.", di şeş saliya Kawa de diya wî, di neh saliya wî jî de bavê wî diçe rehmetê. Piştî apê wî ji bo xwendinê wî dişîne derveyî welêt. Lê ji ber ku mafê îlticayê bi dest naxe, dîsa vedigere welêt û li ber destê hesinkarekî, na terziyekî dixebite. Heta bîst û heşt saliya xwe karê terzîtiyê dike. Piştî lê dinihêre ku deynê Qral Dehaq zêde dibe, dixwaze Dehaq, tevî faîzên xwe, deynê xwe di Zûtirîn demê bidê. Dîsa dibêjin bi navê Medla Malbêbext keçikeye Dehaq hebûye. Ev keçik bûye belayê serê Kawayê terzî; çav berdide wî. Lê dibêjin Kawa, ji ber mirina Leyd Diana hîna jî şîrê digire.

Li hêla din, divê Dehaq tevî faîzan, çar hezar dolarê asûrî bide Kawa. Lê Dehaq dil nake ku deynê Kawa bidê. Lewre Kawa wî dide mehke-meyê. Dawiyê mehke me dibêje, divê Dehaq her roj du dolarê asûrî bide Kawa. Dehaq her roj du dolarê asûrî dide Kawa, lê yek jê sexte ye. Piştî "ustine ustlik", Dehaqê Zalim, Kawa şikayet dike û wî dide girtin. Kawa piştî pê dihesa ku dolarek sexte ye. Kawa ji ber ku dolarê asûrî yê çax li ser tene dîtin, tê girtin û dikeve girtîgehê. Piştî ku bi efûyeke giştî ji girtîgehê derdikeve, dev ji terziyê berdide.

Piştî vê, li qontûrî telefon û Internet-cafeyan dixebite. Paşê lê dinihêre ku di xêr di van karan de nîn e, dikeve îmtihanên zanîngê û beşa filolojiyê dixwîne. Lê çî bixwîne jî, nikare Dehaqê xwînswar û dolarxwar ji bîr bike. Piştî dev ji hemû karan berdide, betal digere; dawiyê jî dibêje, ez heyfa xwe ji Dehaq re nahêlim.

Li ser vê yekê li Dehaq digere. Rojekê, di kuçeyê teng a Nînovayê de wî "siqîstîmîş" dike û avê lê venaxwe, dev û pozê wî di nava xwînê de dihele. Ala wî ji dest wî digire û dihejîne. Li gorî efsaneyê, piştî vê rojê, Dehaq nema dikare dolarên sexte yê asûrî bide gelên Rojhilata Navîn. Bi vî awayî, hemû gelên Rojhilata Navîn ji sexte dolarên asûriyan xelas bûne û ji bo xwe serbestiya çapkirina dolarên sexte bi dest xistine. Ji wê rojê şûn de ev roj wekî bihara dolaran tê pîroz kirin û qewmê Kawa dolarên sexte yê asûriyan diavêje nav êgir û li dora êgir govendê digêrîne. Zarokên ku mezin bûne jî, êdî tu caran li zilm û zorê û dolarên sexte nehatine...

Li aliyê din gelên li Rojhilata Navîn ji peryên xwe sê sifiran diavêjin û develûayonê pêk tînin. Her wiha peryê xwe radizînin Membank û Zîne-expressbankê. Hin jî Hîzbûl-beko dolarê sexte derdixin piyasa yê!..

# Xêzen Beredaxî

camerfiraxsho@hotmail.com



# ZILITO

rewşa wî rewşa kerê nêr e

Comed

camerfiraxsho@hotmail.com



TARA BÊJINGÊ

## CEMİL DENLÎ

### HEFT MESELÊN T.C.'Ê LI SER YEKÎTIYA AXÊ

Dibêjin rojekê rovi diçe cem çelikên hirçê, ji wan re dibêje, "hûn dola min in!" Êvarî gava ku hirç vedigêre, çelikên wê, hal û meselê jê re dibêjin. Hirç diçe, dawê li rovi dike. Rovi, bala xwe didê ku erd şil bû, çivan dide xwe, direve û xwe di nav hejik û dar û beran radike. Hirç jî li pey diçe, serê xwe di nav dar û ber re radike. Serê wê lê asê dibe û jê demakeve. Rovi lê difetile û tê xwe dide paş.

Dewleta me ya bi nav û deng, şan û şeref û xwedî miletekî tev cilên leşkerî ji dayika xwe dibin jî, xwest ku pêşiya xwe sax bike, tiştinan bipelîne. Dest avêt îradeya gelê kurd. Lê serê wê, li pêvajoyê asê bû, qûna wê li derve ma!..

### PARTÎ Û ULLAH

Dewleta T.C'ê ya laîk, dîndar, nûjen, adetparêz, demokratîk, elewî, sunî û xwedî hemû tiştên ku em dibêjin qey ên me ne, mîna gelek tiştên dinyayê, partiyên jî ava dike, ji bo parastina Xwedê: Hîzullah ango partiya Xwedê. Navê wê jî, bi zimanê pîroz, bi Erebfî ye. Jixwe her partî, tevgerêke xweparastinê û şer e, li dijî kesên ne ji wan an jî kesên dijmin. Dijmin kî ye? Dijmin, belengazên kurd ên musulman in, ku hê ji sê saliya xwe de, dest bi nimêjê dikin û ji tezebûna hestî, eniya wan bûye mîna fersên pelên pêçandî û ku di navbera man û nemanê de li ber xwe didin, da ku ew jî mîna mirovan bijîn. Û meytên wan, li ser navê Ullah, hezar caran, roj li nîvro, li sûk û kolanên bajaran ji hewa dihatin xwarê. Xwedê Teala me ji Ullah û partiyên wî bistirîne.

### YEŞİL ARKADAŞ TU LI KU YÎ?

Rojên ku çapemeniya, polîs û artêşa tirk, qul bi qul, li Yeşil digeriyan û nedidîtin, dibêjin Eledîn jî pir ketiye meraqê û bang li cinê xwe kiriye. Lê belê, cinê wî gotiye ku ev tişt sira dewletê ye; alîkarî pê re nekiriye. Eledîn neçar dimîne sozê bide wî ku sirê demaxe. Paşê li ser dîmena eniya cin, Yeşil xuya dibe. Ser maseya wî tijî ye, bi hemû tamên ji cinetê. Cixare di dev, şûşa araqiyê di dest de, milê wî li ser ê Demirel, dûxan ji serê wan diçe û stranên şahiyê dibêjin bi hev re:

Yeşil: Ez Demireelekî biçûûûk immmm...

Nikarim bêyî xwediyê xwe tû kim...


Demirel: Ez Yeşilekîîî meziin immmm...

Şivan immmm, xwedî bizin immmm...

ADARE "OXWEEÊŞI" ADARE KULILKA LI BER BIHARE

YEKARAN AGIR DIBE MIROY  
YEKARAN MIROY DIBE ROMAN

TU ÊDÎ DIKARÎ BI ZIMAN  
EKÎ KAFINE DAXWAZÊN  
XWE BÎNÎ ZIMÊN-HER BÎTÎ?



HEVALÊ CAMÊR ROJBÛYINA XWE PÎROZ DIKEI HER BIJÎMI!..



BU ŞEHRÎ SENİNLE SEYDİM. GİTMEEEEE



NOSTALJÎ

\* DEWÎZ KIZI.



ZILITO BÛ QART-POSTAL! (Ji bo nûçeyê li Azadiya Welat binêrin!..)

Dilop



Osman  
ÖZÇELİK

### BEYREQ

Delal, destê xwe dida ber guhê xwe û heta deng tê de hebû bang dikir. "Gefî mileet! Dengê min tê wee! Roja îne eydiya Cumhuriyetê ye, qeymeqam gotiye bila her kes beyreqa xwe bi dikana xwe ve dar ve ke!.." Delêl bêhna xwe vedikir û didomand. "Kî beyreqê dar ve neke, wê deh banqinot ceza li wan bê birînn! Bila kes nebê me nebihîst haal!.." Delêl ji serê çarşiyê heta dawîya çarşiyê banga xwe didomand. Yên banga wî dibihîstin, bi şerpezebûnekê, li beyreqên xwe yên qermîçî, bengzavêtî, qilêrî û mişxwarî digeriyan, ku bi dikana xwe darve bikin. Beyreq ji nava dexlikan ji dawîya dikanê derdiket.

Gava beyreq bi bendikê bi kujekî derabeyên dikanê ve dihat girêdan, ew, ji cezayê xelas dibûn, ji ber ku hopartor tunnebû, li her navçeyê delalêkî anonsên belediye û dewletê radigihandin. Li navçeya me jî jîrmêrekî bi navê "Çiço" bibû berdevkê dewletê. Çiço, ji bilî delaliyê, karê boyaxkirina solan, firotna pel û tûtina qaçax jî dikir. Çiço mîna dikanekê seyar bû; qelem, çaqmaq (heste), tizbî, kêrik li ba wî peyda dibûn. Wekî din du-sê çakêt û çapûtên nenû diavêtin ser milê xwe û digêrand ku bifiroşe. Te çi kar bigota, Çiço nedigot na. Bi rastî her kar ji destê wî dihat. Ger Çiço nebûbe patronekî endustriya mezin, ji ber qedera wî ya xerab e ku ew li wê navçeyê hatiye dinyayê. Çiço di meha Remezanê de li defa sihurê dixist, di dawetan de şabaşî dikir; berbû û şênîya daweta dianî çosê. Çiço di bangên girîng de defa xwe bi kar dianî: Gurm... gurm... gurm!.. Gefî mileet! Wê sibehîni wafî were!.."


Wê rojê Çiçoyê delal dîsa banga beyreqê kiribû. Li navçeyê dikanekê me hebû. Kekê min ê mezin li ber dikanê ye, kekê min ê biçûk jî şagirtê wî ye. Dikin nakin beyreqê peyda nakin. Li xwe dimînin heyirî, dibêjin, "Hebe tunebe beyreq li malê ye." Kekê biçûk bi bayê bezê bazdide diçe malê.

Li malê diya min hêvîr distrê. Kekê min dibêje, "Dayê beyreq!" Diya min dibêje, "Beyreqa çî! Ez çî zanim beyreq li ku ye?" Kekê min dibêje, "Zû, ecele beyreq! Delal bi çarşiyê ketiye bang dike!" Diya min radibe destên xwe yên bi hêvîr dişo, sindoqa kevnare ya ji dara gûzê vedike, boxçikan tîne der. Sindoqê serobin dike, lê beyreqê peyda nake. Di nava boxçikê de paçekî sor î di mezinahiya beyreqê de bi ber çavên wê dikeve. Radihêje paçê sor û dirêjî kekê min dike, "De hela wî paçikî bibe, pê îdare bikin, heta em jehrteketa beyreqê bibînin!.." Kekê min ê mezin ji cezayê deh banqinotan xelas nabe!..


**Têbînî:** Di nivîsa derbasbûyî ya Özçelik de rêza perde û sehneyan şaş hatibû nivîsandin, lewre em jî nivîskar û xwendevanên xwe re dibêjin biborin!..

# QÛQLA

şereroi



JİYANATE BAŞ Û ARAM  
DIDOME...



...ROTEKÊ  
TUYÊ BI BENÊN  
XWE BIHESÎ...




...TUYÊ FÊM  
BIKÎ KU...



...TUYÊ LI BENAN BIQELIBÎ Û NIKARIBÎ TEVBILIVÎ!




...GELEK QÛQLA DI VÊ  
REWÎŞÊ DE LI BER XWE  
NADIN Û XWE DİSPÊRIN HÊZA ZORDAR.



...KU TU QÛQLAYÊ SÎSTEMÊ YÎ!..

TUYÊ JI BER VÊ YEKÊ GELEKÎ BIQEHIRTÎ Û BI MEMÛ  
KAKIN Û ZANÎNA XWE LI BER XWE BIDÎ

VA YE WÊ DEMÊ, SÎSTEMÊ DESTHILATDAR, KU BENÊN  
TE DI DESTÊ XWE DE DIGIRE, WÊ CEZAYÊ KU DIDE  
DIJBERÊN XWE BIDE TE JÎ...  
\*KARSTÊ MUHALIF.




TUYÊ LI BER XWE BIDÎ...




TUYÊ LI BER XWE BIDÎ...






LÊ TUYÊ LI BER XWE BIDÎ!..  
GÊR TU JI DIL Û CAN BIXWAZÎ,  
TUYÊ BIKARIBÎ BENÊN XWE BIQETINÎ.



WÊ DEMÊ, TUYÊ LI RASTIYA ERJENGÛ DIJWAR RAST WERÎ.  
TUYÊ PÊ BIHESÎ KU TU QÛQLAYÎ!.. EW BI TENÊ  
PÊ LÎSTOKEKE BÊGIYANÛ BÊRUHE.  
VÎN Û ÎRADEYA WÎ TU YÎ! TUYÊ  
FÊM BIKÎ KU SÎSTEM TU BI  
XWE YÎ! Û TUYÊ LI DÎJÎ  
XWE TÊ BI KOŞÎ!.. JI TE  
PÊ VE TU TÎŞT  
TUNEYE!..








LÊ ÇIMA?! MIN QET TIŞTEK  
NEKIRIYE KU...

EZ ZANIM, LÊ EV JI ME  
ME NAQEWIME!...  
FERMAN JORE!...

HÎŞ... DENGÊ  
XWIE NEKE! BIMEŞ...



BIJÎ VEJETERYANÎZM  
BIMRE CEJNA QURBANÊ !..



## Ne ku min dixwest

PENCEREYA PEYVÊ



◆ EHMED HUSEYNÎ

Ne ku min dixwest  
tiliyên xwe di taristana porê te de  
hînî xewê bikim.

Ne ku min dixwest  
guhên berbanga te radestî  
qebqeba kewê bikim.

Ne ku min dixwest  
gavên te ji bobelatê  
ber bi peyvên min ve bilerizin.

Ne ku min dixwest  
lavelavên te bi maça min î sar biderizin.

Ne ku min dixwest  
tu dest bi kuştina çîrokê bikî.

Ne ku min dixwest  
tu dest bi têgihîştina bîhokê bikî.

Ne ku min dixwest  
tu reşgirêdana çiyar  
bi bendên evîndaran ji min re bibêjî.

Ne ku min dixwest  
tu sistegumana giyan  
bi kemendên ji cobaran  
bi ser hinarkên mirî de birêjî.

Ne ku min dixwest  
nalîna te di bergeha roavahiyê de  
bêreng be.

Ne ku min dixwest  
barana te ya ji seferê,  
awirvedana te ya ji hunerê  
bêdeng be.

Ne ku min dixwest  
tu min ji bîr nekî.

Ne ku min dixwest  
tu min di hestên xwe de tîr nekî.

Ne ku min dixwest  
tu dilê min di bişkoja evîne de bikujî.

Ne ku min dixwest  
xwîna min bi ser agirê cejna te de birêje.

# OTOSTOPEKE TRAVESTIYÊN KURD...

Min, ji mêj ve, dil hebû ku wan binasim. Min, çend caran, dil kir bi wan re bipeyivim, lê an pere xwestin an jî reaksiyoneke tûj nîşan dan. Rojekê, min du heb ji wan dît. Belê, ew trawestî bûn. Min dîsa pêşniyara axaftinê li wan kir. Ew, gelekî kêfxweş bûn; me dest bi axaftinê kir. Her du jî kurd bûn. Yekê jê baş bi kurdî dizanî, lê ya din nedizanî. Min ji ya ku bi kurdî nedizanî pirsî "çima tu fêrî kurdî nabe?" Bersiva wê ji pirsê balkêştir bû "ma wê kurdan 'odeyê xwendinê' ava kirin!"

Trawestî, ji aliyê medyaya serdest ve wekî "neşuştiyên darê dinyayê (yeryüzünün lanetlileri)" têne pêşkêşkirin. Lewre hîna kes başbaş bi jiyana û serpêhatiya wan nîzane: Kî ne, ji ku ne, têkiliya me û wan çi ye, çawa dijîn, hemû jî fihûşê dikin an na, çima û bi kê re fihûşê dikin, mirovin çawa ne, di vê jiyana wan de rola me çi ye, ger di jiyana wan de qirêjî hebe, para me tê de heye an na?

## "Va çi ye lawo!"

Trawestî, bi awayekî psîkolojîk ji civakê hatine tecrûtkirin; ji %90 wan fihûşê dike. Ji ber nasnava wan a cinsî hîna tu derdorên siyasî û civakî, bi têra xwe, wan nahewînin. Hema hema hemû keliyên jiyana wan bi devavêtinên wekî "va çi ye lawo!" û destdirêjîyan dibore. Ma li ku û ne li ku; li ba dikandaran, di dora nanstandinê de, di serdana girtûgehan de, li bankeyê, di trembêlan de, partiyên siyasî de û hwd. Tirk, kurd, ereb û ermenî ne; gelek ji wan kurd in. Dibe ku kes rengê vê kozmopolîtizmê necibîne jî, lê trawestiyên Tirkiyeyê ji vê yekê pir kêfxweş in. Tiştê balkêş ev e ku "piraniya trawestiyan jî piraniya muşteriyê wan jî kurd in" Li ser vê yekê trawestiyekê serpêhatiyekê balkêş vegot: "Rojekê yek hat, da ku bi min re rakeve. Dema pê hesiya kaseta Şivan Perwer li ser e, rawestiya. Hinekî fikirî, çavên wî mişt hêsir bûn û çû!"

Trawestiyên ku wekî neşuştiyên têne dîtin, heta cihekî reaksiyonên gel û civakê fêrî dikin, lê li ser bédengiya derdorên muxalîf wiha dibêjin: "Her partî, sazî û platformên demokratîk, di çax û belavokên xwe yên pêşîn de, xwe wekî hêviya hemû kategoriyên civakê yên bindest nîşan didin û ji bo wan tédikoşin, lê dema qala me trawestiyan dibe, hema bibêje her kes kardînan dixwe û lal dibe. Ev nakokiyekê erjeng e; ji aliyê me hîn nehatiye fêmkirin."

Di van demê dawîn de ku yek ji

wan tê kuştin an di bin wesayetekê dimîne û jiyana xwe ji dest dide, êdî civak dibêje: "yekî/a din cehemî!" An kes vê mijarê venabêje, bincil dike an yên vedibêjin jî dikin ku civak van trawestiyan lînc bike. Her tevger û kirina li hemberî trawestiyan mubah e(!): Kuştin, revandin, malşewitandin, bertilstandin normal têne dîtin. Jixwe em ewqasî fêrî mirin û kuştinê bûne ku rojê me bêyî van her du têgînan derbas bibe, ne sebra me tê û ne ji em didebirin!"

## "Ev bi namûsa bav û kalê me dilîzin!"

Di sala 1996'an de Kuçeya Ülkerê, ku girêdayî Cihangira Stenbolê ye, bû qada şerekî dijwar. Li aliyekî şêniya kolanê, çapemeniya tirk, polisên tirk, raya nîjadperest û kevneperest, li aliyê din 80-90 trawestî. Şêniya kuçeyê digot: "Ev fihûşê dikin, exlaqê mêr û zarokên me xera dikin. Divê ji vê kolanê bicehemin, biçin!" Polîsan digot: "Trawestî hizûra welatîyên me xera dikin, divê ji vir bar bikin." Derdorên faşîst û kevneperest jî digot: "Em neviçirkê

çalakî li dar dixist, ala tirkan daliqand. Şêniyê dixwest ku trawestî jî ala tirk daliqînin, an na malên wan didan ber kevîran û agir berdidanê. Polîsan jî, li aliyekî bertil ji wan distand, li aliyê din jî ew dixistin bin çavan; gelek malên wan hatin şewitandin, lêdan xwarin, ro li nivro li kolanên hatin lînc kirin. Gelo ev bûyer nedîşibîya sendromeke din!?"

Trawestiyan jî li hemberî van êrişan nikarîbû xwe biparasta. Wan, tenê dikarîbû laşê xwe birin bikira, xisar bida xwe, da ku ev êrişên xedar û hovane hinekî rawestin. Dawiyê, ji wan yekê xwe şewitand, yekê xwe ji apartmanê avêt û yên

din jî, ji bilî sê-çar heban, ji wê



kolanê bar kir. Aniha li derdorên cihê hewl didin ku jiyana xwe bidomînin.

**Trawestî li ber çavê civakê neşuştî ne û jiyana wan gelekî dijwar e. Lê dema kurd bin ev dijwarî dide navê, wekî her tim!.. Her çend gelek kes ji wan hêvî neke jî, hin ji wan, li gorî xwe, doza kurdayetiyê dikin û ji bo ku di konferansekê navneteweyî de bi kurdî bipeyivin, amadehiya xwe dikin.**

Fatîh Sûltan Mehmedan in! Ev, bi dîn û namûsa bav û kalên me dilîzin!..

Tevî van nirxandinan di çapemeniya tirk de manşet li ser manşetê, nûçe li ser nûçeyê hate weşandin. "huzur arayan sokak (kuçeya ku doza aramiyê dike)", "liseli gençlere dönme tuzağı (dafa trawestiyan bo ciwanên lîseyî)", "son trawesti gidinceye kadar mücadele edeceğiz (heta trawestiyek jî bimîne, em dê tê bikoşin)" û hwd.

## Gundê wan jî hate valakirin!..

Şêniya taxê li dijî trawestiyan

Ev û bi dehan bûyerên bi vî rengî, danûstandina di navbera trawestî û civakê de gelekî xera kir. Ne hewla civakê ya bo naskirin û fêmkirina van mirovan heye û ne jî hêviyekê xurt di dilê trawestiyan heye. Li gorî trawestiyan gelek mirovên wekî wan hene, lê ew xwe vedişêrin û vê yekê bi helbesta Murathan Mungan tînin zimên:

Ji kevneçepgir

ji rastgirên nû

ji qûnekên veşarî

me bistirîne yarebbî!

"Tevî karê siyasî nebin!"

Trawestî li hemberî vê êriş û tra-

jediyê dîtinên xwe weha tînin zimên: "Berî her tiştî, divê ev yek bête zanîn ku rewşa me ya cinsî, bi piranî, taybetiyekê biyolojîk û derûnî be jî, ev tercihek e; ji bo jiholêrabûna me ne hincet e. Piraniya mirovan dibêjin "ev, 'ji ber têrebûna cinsî' pêk tê, lê ne wiha ye. Ji ber hişmendiya serdest ya mêran, dema me dibînin gelek caran an dest dirêjî me dikin an jî teklîfan li me dikin. Hevalên me yên ku fihûşê nakin jî hene, lê dema diçin ser kar, piştî sê-çar mehan ji kar têne dûrxistin; an ji ber bandora derdorê an jî ji ber helwesta xwediyê kargehê. Bi tenê bûyerên ku li vî welatî diqewimin tesîrê li me nakin, ên cihanê jî dikin. Li hemberî bi rêxistinbûna me astengiyên mezin hene. Em û polis gelek caran rû bi rû dimînin, ew ji me re wiha dibêjin. "Tevî karê siyasî nebin, hûn çi dikin bikin!"

Trawestî ji helwesta civak û çapemeniyê ya li hemberî wan gelekî aciz in û dibêjin: "Bi awayekî klasîk em nabêjin, bila hema her tişt rast bibe, lê hinekî hewl bê dayin ji bo naskirina me, dê bê dîtin ku em ne hût in û bi wan re fihûşê nakin. Kesê bi me re dikevin têkiliyê, dîsa mirovên ji vê civakê ne û bi piranî jî yên ku xwe wekî abîdeyên ehlaq bi nav dikin in."

## Em dixwazin li konferansê bi kurdî biaxivim

Her çend trawestiyên polîtîk û rêkxistî hebin jî, piraniya wan mirovên apolîtîk in. Carina di vê psîkolojiya xerab de tiştên ku hem ew pê diêşin û hem civak pê diêşe, pêk tînin. Çiqas mirovên hestiyar jî bin, ewqas jî hêrsok û agresîf in. Her çend şertên aborî, siyasî, çandî û civakî ji bo fihûşê def didin wan jî, piştî demekê ev ji wan re dibe tebîetek û kesayetek.

Helbet di nava wan de yên xwedan pîşe û kar jî hene. Ev, ji bo xwe-îfadekirin û birêxistinbûna trawestiyan dixebitin. Ew çend ku yek ji van trawestiyan dibêje "Piştî demeke kurt wê li Ewrûpayê konferansekê trawestiyan çêbe. Ez dixwazim wekî trawestiyekê kurd li wir bi kurdî biaxivim."

Ev mirovên em qala wan dikin ne çira şîr in û ne jî cinawir. Hûn jî rojekê otostopekê pêk binin!..

**Têbînî:** Di amadekirina vê nivîsarê de bo alîkariya Esmer û Ebrûyê gelekî spas!

EMİN BOZAN

# namedank!



Slav Pîne,

Rastî em bi Pîneyê gelekî kêfxwes bûn. Ez zanim zimanê min ne ji hêla axaftinê û ne jî nivîsandinê ve sererast e. Gelek caran li cihekî bi zimanê xwe nikarim xwe îfade bikim, pîneyên tirkî li nav dixim. Daxwaziya min ew e ku bi alîkariya Pîneyê pîneyên li ser zimanê gelê xwe jê derxim.

Tunebûna Pîneyê ji bo me kurdan kêmasiyeke gelekî mezin bû. Hema bêje qûna me li derve bû; me ji şerman nedikarî derkevin derve. Pîneyê pînek li qûna me xist û em ji vê şerma mezin û giran xelas kir:))) Pîne namûs û şerefa me xelas kir, lewre gerek e em ji dil û can li Pîneyê xwedî derkevin. Kî li Pîneyê xwedî demekeve bila qûna wî pîne bimîne!..

**Baran ROJHAT  
MERCİN/ŞEMREX**



# REMiLdAnK

## BEQ Ên destê sibê hatine dinyê




Merheba Bêhna Şevê!.. Li gorî raporên veşarî yên MGK, MOSSAD û CIA'yê, hûn MEDYA-TV ji SHOW-TV'yê zêdetir temase dikin: Li gorî eynî raporê hûn bernamaya Hekim Sefkan ji ya Reha Muhtar pirtir temase dikin. Hûn niv saet dibin find li ber wan helbestan dihelin. Hay ji xwe hebin, hûn nebin helbestvan, an ne hûnê an bibin gul-firoş an jî evîndar!..

## QUŞXANE Ên berî nivro...



Hevalên Dewlemend!.. Napolyon gotiye, "pere, pere, pere!..", lê dereweke mezin kiriye. Em dizanin em wê çî ji we re bibêjin! Ma hûnê pê pereyê xwe ji NÇM'ê re avahiyekî bikirin an hûnê ji Pîne re "Qesra Çankayayê" yê kirê bikin an jî hûnê bi pereyê xwe tirsiyê çêkin. (ji bir nekin... Bêrika kefen tune ye û wê dinyayê dikanên loqim û biskewêtan bikevine çalakiyên derî girtinê...)

## MOZ Ên piştî dana pez




Hevalên zanîngehzedê!.. Ev deh sal e ji ber ezmûnên "Doğramacı, Berkard, Gürüz û Şivan Silo" yan, hûn neketine tu zanîngehan, lewma serê we bi malbatê re ketiye belayê. Bi ser vê de jî ezmûna Prof. Murat Batğı hûn nexweş kirin. Niha hûn li ber mirinê ne. Bawer bikin heta niha wekî wê sê sed zindî nexweş ketine û ew hilanîne nexweşxaneyên wekî Hasekî, Sêrt, Amed û Nimûneya Enqereyê. Malnemîrat! Hûn di şûna wan ezmûnan de, toto jî bilîstana we vêga zanîngehek ava kiribû.

## CAŞIK Ên ber êvarê...



Hevala xoşewîst! Pêşeroja te baş nexuyaye. Tu yê di rojên pêş de werî binçavkirin. Li gorî Kriterên Kopenhagê, di nezertaxaneyê de wê sêv û dimsê bidin te û ji bo ku tu "sikilimîş" nebî jî wê kompîtûreke bi internet (bila ceyran neyê bira te) bidin te. Dema ku tu derkevî dadgehê tu yê parastina xwe bi zimanê kurdî bikî û piştî vê yekê dadger wê ji Enstîtûya Kurdî ya li Stenbolê wergereki bixwaze.

## ZIRNE Ên nivê şevê...



Ji ber 8'ê Adarê wê zêde qedra hevala xwe an jî dê û xwişka xwe girt. We, ew bir sinema û şanoyê û diyariyeke baş jê re kirî. Ma em ku derê we rast bikin bavê min!.. Dek û dolabên we ji Osmanîyan zêdetir in. Em pê zanin, ji bo ku hûn 364 rojên din stratejiya qraltiya xwe bidomînin, hûn "taqîksel yaklaşmış" bûn, lê kesî "çaqmiş" nekir.

## HUDHUDK Ên heft mehî hatine...



We do êvarî xewneke baş dît. Hûn li ser xalîçeyên marq û dolaran difirîn û bêhemdî xwe riya we bi aliyê welêt ket. We Newroza xwe îsal li gund pîroz kir û tevî şevbûhêrkên gund bûn. We qala şerpêhatiyên xwe yên li Ewrûpayê kir, lewre gundiyan got, "axx... axx... aaaxx!.." Dema hûn ji xewê hişyar bûn, hûn dilzîz û kelogirî bûn û we biryara vegera welêt girt (em pê ne bawer in, lê...)

**pîne**

KOVARA PANZDEROJÎ (ONBEŞGÜNLÜK DERGİ)

- Xwedî (Imtiyaz Sahibi) M. Nuri KARAKOYUN
- Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu): MAZLUM DOĞAN, DOĞAN GÜZEL, İMAM CİCİ
- Berpîrsiyarê Karê Nivîsaran
- (Yazı İşleri Müdürü) ABDURRAHMAN PEKEDİS
- Kargerê Giştî (Genel Müdür) SEYİR KARABAŞ
- Rûpelsazî A. RAHMAN ÇELİK
- Navnîşan (Yönetim Yeri) İSTİKLAL CAD. AYHAN IŞIK SOKAKI 19/1 BEYOĞLU/ İSTANBUL
- Tel: (212) 292 72 70
- Fax: (212) 251 95 85
- E-Mail: pinedank@hotmail.com
- Kargerî (İdare) (212) 251 79 37
- Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A. Ş.
- YAYIN KOORDİNASYON SES BASIN VE YAYINCILIK SAN. TIC. LTD. ŞTİ.
- Belavkirin BİRYAY DAĞITIM
- Nûnergeha Amedê Tel: (412) 223 34 83
- Swêd Tel: 46 86 52 34 29
- Swîsre Tel: 41 76 334 34 74

**WELLAT**

Ji PKK'ê gaveke din a dîrokî.

**Projeya Aştiyê**

"Projeya Aştiyê" di 7'emîn Kongreya PKK'ê hatibû pejirandin ji bo rayedarên dewleta tirk hatil şandin, roja 8'ê adarê, li paytext Belçîka Brukselê jî hêla berpîrsên PKK'ê yên Ewrûpayê ve bi daxuyaniyeke çapemeniyê hate ragihandin.

**Bixwînin**

CAFER KOÇGIRILI HAVİ

(Nûçer: R)



KURO!...  
DEV JI PLAYBOYÊ  
BERDE! BI NAVÊ  
PÎNE KOVAREK  
DERKETIYE.. NAYE  
GOTIN!...

BELEDIYEYA STENBOLÊ  
AFÎŞA PÎNEYÊ YA JI BO  
REKLAMA FERHENGOKÊ  
NEPEJIRAND Û GOT, "EV  
KOVAR EHLAQÊ CIVAKÊ  
PÛÇ Û XERA DIKE"

cici

WELAT

Ji Azadiya Welat sê  
kartpostalên Newrozê.  
17 Adarê li Bayiyan e!

